# **Usûlên nû**

# Birêveberya şaredarîyan-û meclisa parêzgehan (eyaletan) 2003

KOMMUNAL- OG REGIONALDEPARTEMENTET

## Agahdarîyên giring li ser hilbijartinê

• Usûlên nû li ser şêweya tu yê roja hilbijartinê dengê xwe bidî
• Usûlên nû kû tu yê li kîderê bikaribî pêşwext deng bidî
• Usûlên nû ji bo kû tu yê çawan bikarî navên li belgeyên dengdanê de biguherî

**Duşem 15ê septembera 2003** hilbijartina birêveberya şaredarî (beledîye) u meclisa parêzgehan (eyaletan)e. Hin ji şaredarîyan ji roja 14ê septemberêve dest bi hilbijartinan dikin. Dema tu dengê xwe didî, tu bi wê pêwajoyê re dikevî kû dîyar dike kîjan partî u çi kesanik dikarin bikewne birêveberya şaredarî u meclisa parêzgehan de.

Îsal me usûlên (rêuşwênên) nû u hin hêsantir danîne kû hilbijêr bikaribin navên nawa belgeyên hilbijartinê de biguherin. Guhartinên hilbijêr bi ser wan belgeyan de tînin, yê pitir tesîrê li ser hindê danên kwa kê yê bê hilbijartin, u kartêkerîya partîyan tê kêm kirin. Ji ber wê hindê giringe kû pir kes wê imkanê bi kar bînin u navên nawa belgeyên dengdanê de biguherin.

## Tişta nû îsal dema tu dengê xwe didî

Şaredarî dîyar dikin tu yê li roja dengdanê de kengê u li kîderê dengê xwe bidî.

Tu yê bikarî li wê şaredarîya tu lê dijî u navê te li wêderê nawa lîsteya dengderan de heyî kîjan cîyê dengdanê ku tu bixwazî dengê xwe bidî. Îsal wekû salên pêşîne hilbijartinê bo hemû hilbijêran kartên hilbijartinê bi rêya postê re nayê şandin. Her yêk ji şaredarîyan bi xwe biryar dide kwa yê bi çi awayî wî karî birêve bibe.

Rengê belgeyên hilbijartinê bo hilbijartina birêveberya şaredarîyê sipîne u ji bo meclisa parêzgehê şînin. Li Osloyê hilbijartin ji bo meclîsa parêzgehê birêve naçin.

## Tu yê weha bikî:

1. Belgeya hilbijartina wê partî an grûpê rakî ku tu dixwazî li hilbijartina birêveberya şaredarî an meclisa parêzgehê de deng bidyê.
2. Hekû tu hez dikî dengê xwe bidî kesan, bi ser belgeya dengdanê de guhartinê pêk bîne.
3. Îsal bo belgeyên dengdanê zerf nayên bi kar anîn. Belgeya dengdanê bitevîne heta kes nebîne te deng daye bi kê.
4. Here cem xebatkareke hibijartinê heta belgeya te ya dengdanê mor bike.
5. Paşan her bi xwe jî belgeya hatî mor kirin bixe sandûqê.

## Tu dixwazî pêşwext deng bidî?

Li dema nawbera Duşem 11. august heta Înî 12ê september de tu dikarî pêşwext deng bidî.

Şêweya pêşîne dengdan bi rêya postê re hatîye rakirin. Şaredarî yê te agahdar bikin kwa tu yê dengê xwe yê pêşwext li kîderê bi kar bînî. Ger tu nexweş an nuqustan (felec) bî, tu dikarî ji şaredarîya xwe daxwaz bikî ji bo te belgeya dengdanê bişîne mal.

Tu dikarî li her şaredarîya tu bixwazî pêşwext deng bidî. Dema tu bo hilbijartina birêveberya şaredarîyê li şaredarîyek din, xên ji ya navê te nawa lîsteya hilbijêrên wê de, an ji bo hilbijartina meclisa parêzgehê li dereweyî parêzgeha tu lê dijî pêşwext deng bidî, yê tinê belgeyek hilbijartinê bidin te. Li wê lîsteyê de navê hemû partîyên navnivîskirî hatîye nivîsîn, lê navên kesan nîne. Tu wê partîya bixwazî deng bidyê nîşan dikî, an jî navê wê dinivîsî.

Heke tu pêşwext deng bidî, tu nikarî carek din li roja hilbijartinê de dengê xwe bi kar bînî.

## Çawan tu yê belgeyên dengdanê biguherî?

Belgeyên dengdanê dîyar dikin tu deng didî kîjan partîyê. Dema tu bixwazî deng bidî kandîdayan, dibe tu belgeyên dengdanê biguherî/deng bidî kesan. Ji niha u pêve îdî îmkana hindê nîne mirov navê kandîdayan reş bike (jê bibe). Mirov dikare navê kandîdayan jê zêde bike, nekû jê bibe der. Rênivênî ji bo çawan tu yê guhertinê pêk bînî, her weha li ser belgeya dengdanê jî hatye nivîsandin. Ji guherandinê netirse! Her çend tu şaşitîyê jî bikî, belgeya dengdanê nayê havêtin.

**Li hilbijartina meclisa parêzgehê de tu dikarî…**

• *Dengê kesî* bidî kandîdayan li ser belgeyên dengdanê. Li rewşek weha de nîşaneyekê (xiç, x, an tiştek wisan) danê çargoşeya pêşya navê kandîdayên tu dixwazî deng bidyê. Tu dikarî dengê kesî bidî çend kandîdayên tu hez bikî.

Tu nikarî navê kesên ber re ji hilbijartina meclisa parêzgehê zêde bikî.

**Li dema hilbijartina birêveberîya şaredarîyê tu dikarî …**

• Nawbera kesên navên wan li ser belgeya dengdanê de heyî deng bidî *kesan*. Li rewşek wisan de nîşaneyekê (xîç, x yan tiştekî wisan) bixe çargoşeya himberanî navê kandîdayê tu dixwazî deng bidyê.

Heke navê hin ji kandîdayan hatibe zeqkirin (bi nivîsara stûrtir hatibe nivîsandin an hatibe nîşane kirin), ew tê wê manayê ku partî/grûp wan kesan bi ser yên din de tercîh didin u îmkana *dengê zêdetir* dane wan, kû çi hilbijêr dengê kesî bidin wan an ne ew yê wan dengan bigrin.

Tu dikarî çend kesan re hez bikî dengê kesî bidî, çi navê wan hatibe zeq kirin an ne.

• Dengê kesî bidî kandîdayên partî/grubên din, yan hekî gotî yên ber re.
Li rewşek wisan de li cîyek dîyare belgeyên dengdanê de navên kandîdayên partîya xwe binivîsin.

Te hay ji hindê hebe ku dema tu kandîdayên ber re jê zêde dikî, yê beşek ji dengê te bo partî/grûba din here. Giranahîya dengê te bo wê partî/grûba tu deng didyê yê li gor wê kêm be.

Li ser belgeya dengdanê hatye nivîsîn, tu dikarî çend kesên ber re hilbijêrî.

**Fylkestingsvalget 2003**
Framifrå Fylke
**Fylkeslista**

- ☒ Kari Korsnes, 1969
- ☐ Leif Grutle, 1935
- ☒ Marit Strøm, 1952
- ☐ Nina Karlsen, 1976
- ☐ Terje Guneriussen, 1962
- ☐ Mary Smith, 1964
- ☒ Arve Olufsen, 1979
- ☒ Hans Hansen, 1952
- ☐ Signe Martinsen, 1954
- ☐ Olav Jensen, 1981
- ☐ Sigurd Samuelsen, 1945
- ☐ Tony Lindquist, 1982

**Kommunestyrevalget 2003**
Dalen kommune
**Bygdelista for Dalen**

- ☐ **Svein Johansen, 1980**
- ☒ **Maren Berg, 1952**
- ☐ **Lars Holm, 1962**
- ☒ Nadia Kahn, 1970
- ☐ Stine Hansen, 1955
- ☐ Inger Østlie, 1974
- ☒ Eduardo Perez, 1941
- ☒ Hans Hansen, 1952

Personstemme til kandidater
på andre lister (slengere)
Skriv navnet her:

Anders Å

## Kê tê hilbijartin?

Li serî de komîteya hilbijartinê yê bi hejmartina dengan dîyar bike ku partî/grûb yê çend nûnerên wan li birêveberya şaredarî an meclisa parêzgehê de hebin. Paşan komîteya hilbijartinê yê dengên kesan bihejmêre heta dîyar bike kwa kîjan kandîda pêştir dikewin meclisan.

## Kê li hilbijartinê de mafê dengdanê heye?

• Hevwelatîyên norvêj kû li dawya sala hilbijartinê te temenê wan 18 sal tijî bike, u carekê wek rûniştwan li Norvêj hatibin qeyd kirin. Girin nîne kû roja hilbijartinê ew li derewey Norvêj rûniştî bin.

• *Hevwelatîyên welatên dine Bakûr (nordisk)* kû li dawya sala hilbijartinê de temenê wan 18 sal tijî kiribe, heke herî dereng heta 31. mai li sala hilbijartinê de wek rûniştwan li Norvêj bên qeyd kirin u li dema hilbijartinê de li welat de bijîn.

• *Hevwelatîyên dine bîhanî* kû li dawya sala hilbijartinê de temenê wan 18 sal tijî kiribe, heke berî roja dengdanê bê navbir 3 salan li navenda nifûsqeydkirinê de wekû rûniştwanên Norvêj hatibin navnivîs kirin.

Hemû ew kesên dixwazin deng bidin dibe li lîsteya dengderan de hatibin navnivîs kirin. Tu li wê şaredarya ku tu roja 31ê meha mai ya îsal tê de rûniştwan, nawa lîsteya dengderên de hatî navnivîs kirin. Heke te piştî wê rojê mala xwe weguhestîye, niha jî her ew adrêsa te berî 31. mai heyî dîyar dike te li kîderê mafê dengdanê heye.

Ji bîr nekî ku dema dengdanê de dibe belgeya pênasa te bi te re be!

Ji bo agahdarîyên hûr u pitir li ser usûlên nûye hilbijartinê, bi şaredarya xwe re pêwendîyê bigre, an temaşey wê sîteyê bike **www.valg.no**
Adrêsa internetta şaredarîya te her wekcaran pitir weha ye: www.navê şaredarîyê.kommune.no

Hilbijartinek baş!

WeşanTebaxa (august) 2003 ji alîyê
Wezareta Şaredarî- u herêman, bi
hevkarîya Daîreya karê bîhanîyan

Hejmara weşanê: H-2141 Kurmanji

Li ser Internettê weşan li ser wê sîteyê
dest dikewe: **www.valg.no**